



Siyasî
Rû. 02
Nivîsandîn
Di Bin Siya
Diktatoran
De
Helim Yûsiv



Heypeyvîn
Rû. 04
Hacermendî Kurd
Beha Şexo Ji Bûyer-
press Re Di-axivê



MAM
Rû. 05
Wêje û Huper
Anahîta Hemo

Daxwaza Me Rojnamegeriyek Bêlayan û Azad e



Nivîsandin Di Bin Siya Diktatoran De



Helim Yûsiv

Nivîsandin mîna şitlekê ye, gava ku di nav axeke baş de bê çandin û seqayê xweş jê re bê peydakirin, wê ew şitil roj bi roj şîn bibe, bibuşkive û mezin bibe. Wisa jî di hemû astan de nivîsandin dikare ji nivîskarekî re bibe sermîyanekî mezin. Ji asta civakî bigre ku dikare bibe kesayetiyeke berbiçav û bi bandor, hetanî bi asta aborî, ku nivîskarek neçar namîne rojê bi kêmanî heyst seetan ji dema xwe ji bo debara jiyana xwe û malbata xwe winda bike. Wisa hetanî di asta siyasî de karibe bi nivîsên xwe bandorekê li "raya giştî" ya miletê xwe bike û bi helwestên xwe rolekê di nav xelkên xwe de bilîze. Lê, eger ev şitla serhişk ku navê wê nivîsandin e li axeke ne li gorî wê û li beyabanekê an çoleke repinî bê çandin, ku diktatoran erd û ezman lê hişk kirine, wê gavê wê nivîsandin bibe bar, an jî bibe kêra di piştê xwediyê xwe de çikandî. Bi vî awayî wê nivîsandin jî yan bibe liçepixistîneke vala û pesîndaneke erzan û wê xwediyê xwe jî binçavkirin, lêpirsîn, girtin û bidarvekirinê rizgar bike. Lê ewê bibe nivîsandîneke bê giyan û rola xwe ya zanistî û ronakbîrî winda bike. Wisa jî wê qinka nivîskêr ji benên darwendên diktatorên biçûk û mezin dîr bimîne. Ji ber ku mekîneya diktatorê mezin dikare bi hezaran diktatorên biçûk ku jê xerabtirin, çêbike. Nivîsandin jî, weku encam, dibe kirîneke mîna xwekustîne, ku yan nivîskar dîkuje yan jî wî davêje nav gerîneka

şopandinê, girtinê û kuştîneke sipî û ji bilî xwekustîne yan bédengiyê, tenê rîya derbiderî û xerîbiyê li ber wî vekirî dihêle. Di rewşeke weha de, berevajî nixêr giyanî yê mîna azadî û rûmetê ku di siya diktatoran de diçimisin û dirizin, nivîsandin taybetiya xwe diparêze û hemû kirêtiya ku diktator li pey xwe dihêlin dikare bibe mijara berhemên astbilind yê wêje û hunerê. Li van cihên weha ku asta mirov dadikeve pileya herî nizim, nivîsandin dikare bilind bibe ber bi asta xwe ya herî bilind ve. Ji xwe raz û hêza nivîsandinê di hundirê wê de bi xwe ye, ji ber vê ne ti zordar, ne ti diktator û ne jî ti hêz li ser rûyê erdê dikare bibe kelem di rîya herikandina pêlên tîpan ber bi rûpelên sipî ve û rê li ber derbaskirina sinorên zimanan û yê dewlet û welatan bigre. Li Sûriya berî adara 2011ê û bi dirêjbûna niv sedsalê, rewş bi awayekî din bû. Danûstendînen li ser nûjeniyê, modernîzmê û postmodernîzmê, di nav nivîskaran de, li dar bûn. Ji hemuyan weye ku êdî wê ev rewş heta hetayê bidome, lê meselê çend mehan li ber xwe neda û stûnên vê rewşê hejhişin û hatin xwarê. Bi taybetî di qada nivîskariyê de û li ba kesên ku bi mijarên çand û hunerê ve mijûl in, bi carekê re maske hatin xwarê û erda bin lingên her kesî ji wan hejiya. Hêdî hêdî nivîskarek ku bi mijarên nûjeniyê ve mijûlbû vegeyriya ber bi sinorê tayîfe û mezhebê xwe ve, nivîskarek bi mijarên gerdûnî ve mijûlîn vegeyriyan ber bi sinorên eşîre û êla xwe ve û bi hemû hêza xwe dest bi parastîna êla xwe dijî şer û pevçûnên êlên din kir. Wisa jî ramangir û şîrovekarê markisî, ala (La îlaha illa Allah) hilgirt û bi çakûçê xwe dest bi hilweşandina serê dîroka xwe kir û dasa xwe ya sor jî diyarî serokê yekîneyeke çekdarên sunî kir, da ku serê gawirên „Nesîrî“ bifirîne. Herweha kirasê ramanên nûjen, yê ku çavên wan li

hilweşandina pîrozîyan bû, zîvar zîvarî bû. Li bin wî kirasî laşekî lawaz, hejhiş û jihevketî hate xuyakirin, ku dixwaze xwe bi lihêfa mezheb û êlê bipêçe û hezar welatî bike qurbana sinorên êla xwe ya pîroz. Bi vî awayî xîzî an xîyanet bû xala hevbeş ya di navbera hemuyan de. Yê ku bi yekîneyên çekdar re xayîn e, yê ku bi rêjîmê re xayîn e, yê ku bédeng bimîne xayîn e, yê ku dijî her kesî be xayîn e, yê bê helwest be xayîn e, Yê ku li kêleka miletê xwe û di nav xelkên xwe de li ber xwe bide xayîn e, jixwe yê ku jî meydanan jî bireve ew xayîn e. Wekî ku me ji nişkê ve û piştî pêncî salî ji nivîsandinê, keşîf kiribe ku nivîskarek me tenê komeke xayînanê ye. Deng jî hêla kesên ku li kêleka çekdaran û şoreşê sekinîne, Wisa jî dengvedana van dîtînan li aliye din, ku weku aliye rêjîmê tê hesabandin, olan dide, ku heman hevok tê dubarekirin. „Evana komeke xayînan“.

Zindiyên herdu aliyan xayîn in û miriyên her du aliyan şehîdên mezin in. Niha ez van gotinan rêz dikim, dê hinek min jî, ji ber ku ez ne li her du hêlan im, bi xîyanetê tawanbar bikin, ku ev helwesta „ne li dijî û ne pê re“ di dema şoreşan de helwesteke xayînan bi xwe ye. Di encamê de, ev dîmenê trajekomedî yê li holê encama sereke ya xerakirina giyanê mirovane ku ev pêncî sal in li welatêkî ku hem nixêr wî yê giyanî û hem jî avahiyan wî yê bilind bi ser serê xelkên wî welatî de tene hilweşandin.

Eger rabûna perdeya li ser van kavîlan û vî xerakirina giyanî û çandî ya ku em tê de dijîn hewcedarî çend mehan bû, gelo rastkirin û çekirin û avakirina van avahiyan hilweşiyayî, wê hewcedarî çiqase dem be? Gelo wê karabin jî nû ve bêne avakirin jî? Ev jî pirseke wisa ye ku pala xwe dide eşê û di nav mij û dûmanê de kûr û dîr diçe.

Nebêje Min Bi Kurdî Nivîsiye !



Rodî Hesen

Kurdên Rojavayê Kurdistan mîna Kurdên parçên din ên Kurdsitanê rûbirûyê sitem, zulm û zordariyeke yekcar giran bûne, û çewandinên mezin dîtine. Lewra jî „bi gelek hûrguliyên wê zordariyê di civatên xwe de vedibêjin û şevbuhêrkên xwe pê derbas dikin. Giringiya bidawîyanina wê sitemê û bidestxistina mafên rewşa yê gelê Kurd weke neteweke resen, ku di nav de mafên xwendina bi zimanê Kurdî biserbestî û giringîpêkirina çanda Kurdî, tewerê sereke yê van nîqaş û giftûgoyan e. Lê di pratîkê de, tiştekî din heye. Kurd bi destên xwe projeyên şofenist û dagirkeran pêktînan û biserdixin. Wate „bi awayek ne rasterast projeyên şofen ji qonaxa masterplanîyê dikin warê pratîkê de. Ev xwexapandin jî her curê zordariyeke derveyî kambaxtir e. Şop û dewsenê ve xwexapandinê bi zû jî çareser nabin.

Heftiya borî, digel jimareke hevalên ji rojavayê Kurdistanê -nivîser, hunermendê şewekarî û rojnamevan in- li kefteryakê li bajarê Hewlêrê, paytexta Herêma Kurdistanê, rûniştibûm. Di dirêjahiya civatê de rewşa siyasî ya herêma Rojhilata Navîn û çarenivîsaziya wê qonaxê bo Gelê Kurd bû mijara herî sereke. Hevalek ji wan hevalan xwest ez nerîna xwe di vî barê de bênim ziman. Min jî jê re got: „Min nerîna xwe di gotarekê de, ku berî çend heftayan di rojnameya Wişê de belavbûbû, (Wişê) rojnameyeke heftiyane ye li

Hewlêr bi Kurdî ya jêrîn (Sorani) derdikeve, min ew nerîna aniyê ziman û dixwazim tu bixwîni. Bersiva hevalê min dereng neket û di cî de, bi zimanekî matmayî ji min pirs kir: „Nebêje min te bi Kurdî nivîsiye“?! Vê pirsê seyr (ecêb) a hevalê min -li gorî min- gelek serpêhatiyên li dor rewşa nedilxweş a zimanê Kurdî ku bi min re di van çend salan de derbasbûne, Ji malxwezîneya bireweriyana a mîjî derxist û ber bi serû ew hilkişandin û vejandin.

Yek ji wan serpêhatiyên, sala 2009 an dema ku ez endam bûm di partiyeke Kurdî de, ku nûneriya wê li herêma Kurdistanê li bajarê Silêmanî heye, (niha ez ne endam im). Di konfiranseke wê partiye de, dema serkirdeyê wê partiye naskir ku giringiyê bi ziman didim, ji min re got: „Heta tû babetekê bi Kurdî bixwîni, tu dê sê babetan bi Erebi bixwîni“.

Ji dêlva ku min li ser fêrbûna zimanê Kurdî meraqîr û tîtir bike (weke ku min hêvî dikir), berevajî wê çendê wî hewlê min dilsar bike!

Carekê, ne şaş bim sala 2008 bû, li nik hevalekî xwendinê bûm, dema wî hevalê min dît ku ez malperên Kurdî dişopênim, bi zimanekî mişt sivkîpêkirin got: „Çima tu zimanê Kurdî dixwîni? Zimanê Erebi hesantir û dewlemetir e“.

Wê gavê min hest kir ku sermê bi temamî ez dagir kirim!

Destpêka hatina me bo berdewamkirina xwendinê li herêma Kurdistanê, bihtirên xwendekarên Rojavayê Kurdistanê li heman malaxwendekaran diman. Me xwe bi hev dida naskirin û behsa projeyên siberojê dikir. Komeleke karên hevbeş jî hebû ku me dixwest bi hev re bikin. Ew xwendekarên ku niyaz û xwesteka wan a fêrbûna zimanê Kurdî hebû, gelekî kêr bûn.

Ya malwêrantir ew bû ku xwendekarên me yê ku di zanîngeha Selahedîn de dixwendin daxwaz dikirin ku ez mûnên xwe bi zimanê Erebi bidin ji ber li zanîngeha Selahedîn zimanê fermî Kurdî (Zarava Sorani) ye. Xwendekar dikarin hinek caran bi Erebi ez mûnên xwe bidin bi mercê erêkirina profesore ku dersê dide wan. Ev rewş hevdem li gel wê çendê bû, ku bêhtirên xwendekaran endamên partiyan Kurdî bûn. Xala hevbeş jî ya ku tevahiya partiyên bo wê xebatê dikin ew e „Xebat bo rêdan bi fêrbûn û xwendina zimanê Kurdî bi awayekî fermî li welat (Sûriya)“.

Paş destpêkirina kirîza niha ya welatê Sûriyê, desthelata rêjîma Beşar Esed bi ser Rojavayê Kurdistanê de hin bi hin kêr bû. Ew jî derfeteke zêrîn bo Rojavayîyan anî pêş. Li ser asta zimanê Kurdî jî nişanên dilxweşker derketin, bi sedan korsên fêrbûna zimanê Kurdî, bi astên cuda cuda, lidar ketin. Saziya Zimanê Kurdî (SZK) hat damezrandin, SZK ku yek jî rêxistinên ser bi Tevgera Civaka Dîmokratî (TEV-DEM)ê de ye, di çarçoveya zimanhişkirinê de xebateke cidî û balkêş kir, lê dîsan jî, ta niha di torên medya civakî (Facebook) de, zimanê nivîsîn û pêwendîkirinê Erebi ye. Herwiha, tevî ku gelek insiyatîvên Kurdîkirina Kurdên Rojava destpê kirin, hîna jî zimanê fermî Erebi ye. Malperên Kurdên Rojavayê Kurdistanê yê ku beşê wan ên Kurdî hene, degmen in, ji xwe malperê Kurdî efyûn in!

Her ku ev rewşa dilnexweşker tê bîra min gotîneke apo Osman Sebrî xwe li ber çavên min radixe: „Mirovê giringiyê nede ziman, cih li jiyana netewî nagire“.

Hêvîdar im, zû ew qonaxê ku êdî kes nepirse: „Nebêje min ku te bi Kurdî nivîsiye“?!

Şerê Ne Diyar Li Ser Sê Derwazan



Luqman Silêman

Nexşeya siyasî ya hersê partiyan mezin li Kurdistanê jî ku dest pê dike? Di roja 1.6.1976an de Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistanî li Şamê hat damezrandin û ji wê demê ve heta weke niha ew girêdanên Yekîti û bi taybet Mam Celal bi Şamê ve mane, lê kes nizane ew bi çî

watê û bi çî girêkê hatine girêdan, diyar e ku kes nikare wan girêkên ji çî salî ve hatine girêdan veke û ne jî nas bike. Lê piştî ku Şoreşa Islami li Îranê bi ser ket ew peywendiyên Yekîti Nîştîmanî di navbera Şam û Tehranê de hatin hevbeşkirin.

Demuqrati Kurdistanî ew jî piştî ku Şoreşa Kurdî li Kurdistanê Iraqê têk çû, piraniya kadir û serkirdayetiya wê xwe li Îranê girtin û carek dî ji wir Şoreşê li Kurdistanê Iraqê destpê kir, PKK jî di sala 1984an de ji Libnanê û di bin desthilatdariya rêjîma Sûriyê de destnişana Şorerşê li Bakurî Kurdistanê kir, her sê partiyan mezin di Kurdistanê de bi her çar

rêjîmên dagirker re di navbera şîdandin û sistkirinê de bûn ta salên notî, ew şerê ku di nav her sê partiyan mezin de jî şerê ragihandinê dakete devê livingê her yekî dixwest yê dî jî meydanê rake lê kesî nikarî wê bi dest bixe. Bêguman ew şerê di navbera her sê partiyan ne gelek dîr bû ji bandora peywendiyên ku bi salan bi her çar rêjîmên dagirker re hatine danîn.

Piştî ku Kurdistanê Iraqê Fedralî hate erêkirin û her du partiyan mezin bûne desthilatdar, alavên listîkê hatin guhertin, Nûşêrwan Mistefa ji nav Yekîti vekîşiya û partiya Goran damezirand û xwe weke partiyek opezesiyon nişan kir pêşberî herdu partiyan mezin, lê Mistefa nikarî jî rêjîma Îranî dîr bikeve û carek dî ma êsir û

girêdayî şîretên Îraniyan. Ji ber vê yekê hin kesan digotin ku vekîşandina Nûşêrwan jî nav Yekîti bi xwe listîkê bû di navbera Mam Celal û Nûşêrwan de, ji ber ku piştî hikûmeta Kurdî çêbû û her du partî bûne desthilatdar rewş jî û rengê xebatê jî pê re hatin guhertin û herêma Kurdistanê ma weke du hikûmetan di yek avahiyê de, partî ma li ser du derwazan yek yê Bîrahîm Xelîl bi Turkiyê re û yê dî Sêmalika bi Sûriyê re, partiyan biçûk xwe li partiya dî girtin û Partî xwest ku hêdî hêdî cilikê jî bin lingên Mam Celal bikîşîne û Yekîti kete xirêna mirinê.. ji lewma Nûşêrwan li ser dikeke cida hate xuyakirin.

Îro piştî şoreşa Sûri û ragihandina PYD ji sê kantonan re şer û listika di nav her sê partiyan de hate asteke dî, ew şerê ne diyar yê ku di bin

gelek nawan de nema bê berjewendiyên herêmê û bandorên wan tene kirin....

Heger ku Îran deriyê Silêmaniyê li ber Goran û Yekîti bigre weke masiyê ku mirov wî jî avê derxe, wê bikevin ber xirêna mirinê yan divê xwe radestî partî bikin û ev nemumkin e li cem xelkên Silêmaniyê û heger ku Turk jî deriyê Bîrahîm Xelîl li ber partî bigrin ew jî weke masiyê ku mirov jî avê derxe yan wê xwe radestî Yekîti û Goran bike û yan wê bikeve ber xirêna mirinê. Ew razî yan ne razî ta asteke wê di bin bandora tîkiliyên bi Turk û Îraniyan de bimînin, lê ew binbandor çiqas in..!?

Ev şerê îro yê kevn e, lê bi alav û şewene nû ye, lewma dema ku Partî Demuqrati erênîyê nade kantonên ku PYD (PKK) li Sûriyê ragihandin, ew ne ji ber ku ew kanton

hindik in ji kurdan re na, yan PYD nêzikî rêjîma Sûriyê ye, na ji ber ku kurd ketine du xetan... Xeta Îran,Şam, PKK, Yekîti, Goran, PYD ev yê ku kantonan dipejirînin û Turkî, Demuqrati û hin partiyan ku kantonan napejirînin...

Îran bi hemî hêz û alavên xwe piştigiriya her sê kantonên li Rojavayê Kurdistanê dike, ne ji bo ji kurdan hez dike na, ew dixwaze rêyekê jê re bimîne ta bighe devera Elewîyan û ya dî li dijî Turkiyê ye. Piştî heft-heşt mehan ji şoreşa Sûriyê PDK-Iraq xwest ku PYD ji PKK bistîne û wê bixe bin bandora xwe, lê hemî hewlên wê tîk çûn...paşê PDK xwest partiyek cewawerî li himberî PYD çê bike da ku desthilatdariyê hevpar bike bi PYD re..PDKS hate ragihandin lê ta ku jî PYD jî were kesî jî xwe re nake hevpar....

Hunermendê Kurd Beha Şêxo Ji Bûyerpress Re Di-axive

- Du caran hewldana kuştina Mihemed Şêxo bûye, carekê di sala 1981ê de di xaniyê wî de, keça wî Felek di destê wî de bû.

- M. şêxo pirtûkek ji Farisî wergerandibû zimanê Erebi, lê nizanmim mijara wê çi bû.

- Şerê ragihandinî gelekî rola xwe li ser xelkê

Rojava kir, me caran dibihîst ku Cebhet Elnesra wê sibe li hindirê Qamişlo be.

- Em gihan nexweşxana niştimanî li Qamişlo, Mihemed Şêxo çavên xwe vekiribû, gote min: Yawo, tu li ku bû yî?

- Helbestvan M.E.Hiso ji bil strana (Bûkê Rindê Ciwanê) nedabû hunermend M. şêxo.

- Ez sê caran daketim sûka Qamişlo, min tu riwên nasyar nedîtin, mixabin ... hemû biyan bûn.



Hunermend Beha Şêxo çawa li koçkirina xelkê Rojava dinere?

Yên ku karkerên wan tune be, ji mafê wan e ku berê xwe bidin Başûr, lê kesên ku dirin li bajaran xaniyên buha kirê dikin, ev yek ne dirust e. rast e, av, kehreba, û rewşa aborî aloz e, lê xelkê li Rojava man çawa jiyana xwe berdewam kirin, beşt bi xaniyan ve nehiştin, kursî û cil şewitandin. Ez sê caran daketim sûkê, min tu riwên nasyar nedîtin, mixabin ... hemû biyan bûn, teqez mal û milkên wan kesên ku koç kirine ji wan kirîne û ketîne şûna wan de. Eger sibe hilbijartin çê bibin wê asta kurdan gelekî kêmbê, û Erebi lê zêde bin, ew jî tê wateya valakirina herêma kurdî - mixabin - bi destê kurdan, yan jî wê herêm bibe herêmên ku nakokî li ser hene mîna Kerkûk û Mûsilê.

Şerê ragihandinî gelekî rola xwe li ser xelkê Rojava kir, me caran dibihîst ku Cebhet Elnesra wê sibe li hindirê Qamişlo be, yan teqînek li firokxaneyê çêbûye, lewra xelkê bi hezaran bar dikir.

Hunermend Beha Şêxo çi ji bo şoreşa Sûriyayê kir? Ji sal û nîvekê vir de me gelek çalakî kir, min û çend xortan dor şevê di 7-12an

de şevê hunerî lidar xist, dor 1400000 hezar qizinc kir, me 450 ji wan şandin Serê Kaniyê kun û destpê kiribû, 350 ji bo Amûdê û me 350 sand Kobanê. Me di meha 3-2013an de (8)TN cil dan hev, min nivê wan bi destê xwe vala kirin û hevbeş kirin, kiriyên wan tenê dor 40hezar kiron ta Kobanê çû, mehekê sax li hêviyê man ku karibin hinekan ji wan derbas bikin bajarê Efrînê derfet tune bû, û wê çaxê jî şerê bajarokên Til Erân û Til Hasil jî lidar bû, me hinek gihandin wir jî. Ji bilî wî jî hinek komelên kurdî hebûn seven hunerî lidar dixistin ji bo Rojava, ez dor 9-10 şevan beşdar bûm bi wan re, pereyên wê jî di riya wan re hat şandin. Berî ku ez werim ji bi hefteyekê şevê lidar ket ez wek hunermendê sereke bi alav û tembûr û kurê xwe beşdar bûm, ew jî dor 17-18 hezar Kiron bûn, me ew pere jî xistin destê Encumena Niştimanî de ku wê şevê ew jî amade bûn, ta ku di riya wan re bigihe welêt.

Gelo ti piroje ji bo straneke li ser şoreşa Sûriyayê li ber destên we tune ne?

Her hunermendek neînek wî heye. Yekem xal dibe ku gotinên ez pê bawer im peyda nebin, xala duyem, min nedixwest ku ez straneke bêjim û piştî du

mehan - wek hinek hunermend- poşman bibim. Vê dawiyê min helbetek helbestvanê me Dildarê Midî ku bi şeweyekî rexneyî li ser tevgera Rojava nivîsandiyê awaz kir. Sed serkirdeyên Kurdan hene û her yek aş çep digerin, her dem jî qurbanî ev millet jar û feqîr e. me digot yekbûna we digotin em li Qamişlo ne em nikarin, baş e ev du sal û nivê we hûn li Hewlêrê ne, çima hûn li hev nakin, kî bipê we de heye? Hin jî gotinê wê helbestê dibêje:

Kurdo tu biner îro carek çima em li paş in yan gelo em şaş in. Em jî weke gelê cihanê bi milk û aş in lê em sed qeraş in Her yek ji we bi rengê aşî digerinê

lê her sed kelaş in Arvanê me tê hêran bi sed çerxên ne wek hev ev qasî ne baş in

Qeraşê xurt û pêlwan tev bibin yek hinganê em qelaş in Ta xelk bibêjin her bijî bo kurd û Kurdistan de gotin belaş in

Helbestvan Mihemed Eîl Hiso di hevpeyvînekê de gotiye Strana Hunermend Mihemed Şêxo ya bi navê (Narinê) min nivîsandiyê, tu çi dibêji?

Helbestvan M.E.Hiso ji bilî strana (Bûkê Rindê Ciwanê) nedabû hunermend M. şêxo, ew jî bi şewekî govendî û dilanî hatiye stran, lê ya (Narinê) ne ya wî, ew bi xwe Filiklor e.

Du- Sê pirtûk li ser jiyana û mûzîka hunermend M. Şêxo çap bûne, lê yekê jî ji wan xwendevan tîr nekirin û dilê wî rehet nekir. Gelo sedem çi ye?

Bi rastî min nedixwest ez tu pirtûka li ser jiyana wî biweşînim û beşek ji wê jiyane wendayî be, ji ber beşê herî giring jiyana wî li îranê bû, ez li hêviya regeznameya xwe ya Siwêdî bûm, niha ez dikarim serbest herim. min navê çend kesên ku pê re dijiyan peyda kirine, ez dixwazim ew tiştên ku li ber destên me tune ne nas bikim. Ez di 2004an de çûm îranê, çûm bajarê wî(Gunbedê xews), û dibistana ku M. şêxo lê mamoste bû, waneyên mûzîkê û dûv

re yên olî didan. Li gor tê bîra min M. şêxo pirtûkek ji Farisî wergerandibû zimanê Erebi, lê nizanmim mijara wê çi bû, tiştê ku ez dizanim di bin çavdêriya re derbas bûbû, û navê wî li ser heye. Dema ez li îranê bûm hunermendkî Farisî CDyek da min, tê de awaza strana wî ya (Di baxan de birin sorgul) û (Eman leyê), li ser nivîsandibûn "Mûzîk Mihemed Şêxo". min li wir wêneyê dibistana wî û odeya wî ya ku tê de hewldana kuştina wî bûye kişandiyê.

M.şêxo di hewldana kuştina xwe de xwe xist qorzikekê û telefon vekir, got: Eger ji niha û ta niv saetê ez nemirim ez nema dimirim.. Dengê fişekan di telefonê re dihat bihistin.

Çiroka hewldana kuştina wî çi ye?

Ew veşartî ye, sedem ne diyar in, lewra ez dibêjim divê ez wan kesên ku pê re dijiyan bibînim. Du caran hewldana kuştina wî bûye, carekê di sala 1981ê de di xaniyê wî de, li ber pencerê derbas bûne û fişek teqandine, ew cam û qizêz li riwê wî ketibû, wê çaxê keça wî Felek di destê wî de bû. Cara dî dema ku hatibû Tahrane kaxezên xwe çê dikir ta ku were Rojava, derbas dibe navenda partiyekê - nayê bîra min kîjan bû - piştî pazdeh deqeyan guleyan digrin ser navendê û wê gulebaran dikin, M.şêxo xwe dixwe qorzikekê û telephone vedike, dibêje eger ji niha û ta niv saetê ez nemirim ez nema dimirim, û dengê fişekan di telephone re tê bihistin.

Di salvegera çûna hunermendê me M. Şêxo, tiştine girîng û pir hestiyar hatin gotin wek gotina "Hunermend M. Şêxo ne mirina Xwedê mir, lê hatiye kuştin" gello ev gotin ta çi redêye rast e?

Ji ber wîlo min xwe li sinor xistiye û ez hatime. Ev gotin nehevdugirî ne, 25 sal derbas bûn, dektorên ew derman dikirin kurd bûn, divê

mirov vegere documentan, ez nuh vegeyiam, ez li malê geriyam û min "tehlîlên" M. Şêxo yên her sê rojên li nexweşxanê derxistin, û niha li ber destê min in. Başê, ez hatim, min bang kir wî camêrê ku van gotinan dibêje û min bûyer jê re vegeandin: M.Şêxo sê mehan li Şamê ma bû, pîreka birayê me Hecî biribû ba dektor, serê salê bû serma li wir giha 10 pileyan di bin Oê re, li wir serme xwaribû û xwîn avêtbû, piştî giha mal çû ba Dr."Behmen" dermanin dabûnê.

Dawetek li ba min hebû li gundê "Xirbê Kurma" min gotiyê: tu dixwazî ez narim. got: Na, na ez baş im. Min xatir jê xwest û ez çûm. Roja dawetê bi xwe, nivro dikeve, û wî dibin nexweşxanê, min nas kir tiştê ne normal heye gava 9ê şev layê apê min û zavê me ketin deriyê dawetê.

Em gihan nexweşxana niştimanî li Qamişlo, çavê xwe vekiribû, gote min: yawo, tu li ku bû? Ez û M.Şêxo tevî biratiyê heval bûn, hin jî dema li îranê bû name bi navê min dişandin, ew name jî min parastine.

Dektorên ew derman dikirin Dr.E.mecid Xelîl, Dr.Beşîr Ehmed, Dr.Ferîd Cima û hinek din bi roj dihatin ez ne li wir bûm, digotin em ê komîteyekê ji bo dermankirina wî çê bikin,

- Li ku ne ew name?

Li ba min li Siwêd in. Sê şevan ez li nexweşxanê dimam ta 8ê sibehê, sibehan ez dihatim male û birayê min li wir dima, roja çaran ez hatim malê û vegeyiam ez pêrgî wan bûm go baş bûye em tinin malê.

Dektorên ew derman dikirin Dr.E.mecid Xelîl, Dr.Beşîr Ehmed, Dr.Ferîd Cima û hinek din bi roj dihatin ez ne li wir bûm, digotin em ê komîteyekê ji bo dermankirina wî çê bikin, ew jî ne çû serî ji ber ku piştî du sê rojan gotin baş bûye.

Roja diwîdan ez tirsiyam û pir pê êşiyam, ji ber xwîn di nav destava wî de hebû, min li deriyê dektorê nobedar da

(Dr.Ferîd Cima) bû, go: Tu tişt tune ye, ji derman e..! Roja çaran em hatin malê birayê min E.Mecid (ew jî çûye rehmetê) û zavê me Şikrî jî li wir bûn, ez mam ta 12ê şevê, min henek jî kirin, M.Şêxo jî keniya, û duv re go: Rabe here malê ev çend şev tu ranezaye, ez baş im û va Mecid û Şikrî jî li wir in. Ez çûme malê 5ê sibehê bang min kirin, ta em gihan wir piştî xwe dabû me, em çûn tamam bûbû.

Tiştê ez dixwazim bêjim nexweşiya M.Şêxo û ya rehmetiyê Kenan (ew jî di xew de çû) û ya İbrahim kurê wî eynî nexweşiya ye, jê re dibêjin (Marfan) êşeke dil e, ji bav û kalan digihe zariwan.

Li malê yan li nexweşxaneyê tamam bûbû?

Na li malê di xew de çûbû. Tiştê ez dixwazim bêjim nexweşiya M.Şêxo û ya rehmetiyê Kenan (ew jî di xew de çû) û ya İbrahim kurê wî eynî nexweşiya ye, jê re dibêjin (Marfan) êşeke dil e, ji bav û kalan digihe zariwan. Em bîn ser pîrsa te, min gote wî ciwanmêrî: Min ji bo gotinên te xwe tîlên sinor xistiye, ez hatime û wek bîra ji mafê mine jî -tiştê li ba te hebe- ez zanibim û eger te wanbariyekê hebe divê di riya dadgehê re be, a din dokumentên li ba min êşa wî diyar dikin.

Di hejmarê dî de bixwînin: Çiroka girtina tomargeha "Felek" ya Mihemed Şêxo kî li pê bû? Sedem çi bûn? Girtina wê çiqasî berdewam kir? Kê dîsan ew vekir.? Encam çibûn.



Diroka Rojnamegeriya Kurdî Li Rojava ...

Asoyên Pêşketinê



Mihemed Şexo

Pêşketina rojnamegeriyê durîşmeke balkêş e ji pêşveçûna civakê re. Ango, ew nişana serketina civakê ye. Hinek din wê wek neynika daxwazên millet dibînin, çawa bandorek wêyî xurt li raya giştî heyell!

Wîha rojname dibe çavdêra yekemîn ji rêveçûna civakê re, bîrîyarên civakî gencin dîke û serûka hemî desthilatan bi degelî hiltîne, bizav dîke ku deriyê paşerojê nişan bike.

Insiklopîdya Ingilîzî rojname weke derçûneke katene bê cilde di werzîna bi sistem de dertê û nûçeyan diguheze. Piştî sala 1600î bi avyêkî tekûz yekemîn kovar di sala 1622an de li Ingilîterayê belav bû, navê wê (A current of General News).

Kesê pêşî çapemenî anî ew Hisên Hiznî Mokîryanî ye, sala 1915an ew anî Helebê. Lê yekemîn kovara Kurdî (Kurdistan) e, ew li Qahirê ji aliyê Miqdad Midhet Bedîrxan di 22/4/ 1898an de derçû.

Miqdadê pêşewa piştî çend hejmaran diçe ber dilovanîya xwedê û birayê wî mir Ebdîlrehman rêça wî seretayî kir.

Di vê gotarê de em ê durî û durînen çapemeniya Kurdî bişopînin, lê di serî de divê em tabloya derçûyên Kurdî rêz bikin da her tiştî ji me ve xuya bibe û em karibin mijara xwe li destê xwe bipêçin.

Qunaxa Bedîrxaniyan:

Kurdan ji mîna mîletên din pêdiviya çapemeniyêke bi zîmanê xwe zanibûn. Lewra, zanyarê Kurd Miqdad Midhet Bedîrxan tevî ku ew sirgon bûbû, roja 22/4/1898an li bajarê Qahirê yekemîn rojname Kurdî belav kir.

Çend durîşmên rojname kurdistan:

Ew riyaksonek berçav e, ku Kurdan tucarî dev ji xebatê bermedaye, ev jî şeweke tekoşîna aşîtiyê ye. Ew dengê azadiyê ye, çimkî ew serbixwe bû, ti komele yan rêxistin li dûv tîne bûn, xwedî bangeke ronakbîrî bû ji bo ku ji xewê û bindestiyê hişyar bin. Nemaze, piştî wê xîzîna desthilatiya Osmanî ya ku rapêrînen Kurdan bi tundî vedimrandin.

vê yekê rojname bang li xwendevanên xwe dîke da (têkstên folklor û kevnatora Kurdî kom bikin).

Kovara Hawar û Ronahî:

Ew her du jî mir Celadet û birayê wî Kamîran Bedîrxan diweşandin ji sala 1932an ta sala 1945an, mebest ji derçûna wan weke mir di Hawara yekemîn de gotiye ev e: Hawar dengê zanîne ye, zanî xwenasîna e, xwenasîna jî we re rîya felat û xweşiyê vedike..... Hawara me dê berî her tiştî heyîna zîmanê me bide naskirin.

Bi rastî piştî komela Xoybûn û çalakiyên Bedîrxaniyan gelek kovar derçûn mîna kovarên Roja Nû(1943), stêr(1943), Dengê Kurd(1957), A g a h î (1 9 6 6 - 1 9 8 5), Gulîstan(1968-2009), Gelawêj(1979-2007), Stêr(1983-1994), Zanîn(1991-1997), Aso(1992.....)Pîrs(1993.....).

Rojnama Nûdem (2013-2014):

Rojnameke pazdero e, siyasî, rewşnîrî, serbixwe bû. Ew mîna mercên çapemeniya şarîstnî dixuya û wê karîbana nameya xwe ya mirovanî biglîhanda xwêneran çimkî karmendên wê (Qadir Egîd, Ehmed Bavê Alan û Alan Hesen) bi comerdî hezkirina xwe ji rojnamegeriyê re berçav dikirin, lê piştî hejmarê (16/17)an ew rawestîya û bû cîhê xemgîniyê, lê em bi hevî ne ku ew karmend bê çîlo Nûdem bi dan û nerînen girîng û tîvel xemilandin dîkarin di vê bizava xwe ya nû de dîse rojnameke çaktir li ser destê xwe yê bûne xemilgirîren rastiye lîdarxin.

Nêrineke rexneyî:

Li gor şopandîna min ku nêzî sih salî wek xwendeyar û daner ji pîreyî kovar û rojnamên Kurdî re, em dikarin çend tîbîniyan pêşniyar bikin:

1- Derçûyên Kurdî (kovar, rojname) bi şêna rewşnîrî serbixwe û ji ber heyameke azad nebû, berde-wamî jî bi jan, perîşanî û eş bûn (jiyana mir Celadet û bîra Qederê, wek nimûn e).

2- Niha kulekek di tariyê de vebûye, mercê sereke ew e ku hêz û şên nêzî hev bibin û derçûyêk birêkûpêk bibe amanc.

3- Nan bidin nanpêjan.... ev tî wateya ku pêdivî birêvebirîyeke karnas û xwedan alav û hişekî zanistî heye, ne ku li gor çêja pîlanzanan be, yan werîs di destê siyasîmedaran de be.

4- Giranî ji xwenasîne re bê dan, nemaze vekolînen li ser zîman û diroka Kurdî.

Jêder

- 1- Tarîxa Edebyata kurdî-Prf. Qenatê Kurdo - R 23...30
2- Panoramek li ser rêveçûna rojnamegeriya Kurdî li parçê (Rojava) Sûrî-Ebdîlqadir Bedredîn.
3- Tarîx Elsehafê FI Sûriya- Mihemed Xelef(Rewî).
4- Diroka rojnamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê(1932-2012)-Konê Reş.
5- Mûceze Tarîx Eledeb Elkurdî Elmuasîr-Prf. Marûf Xîznedar-werg-er Ebdîlmeclîd Şexo.

Helbesta Nûjen



Ciwanê Ebdal

weke tî zanî pir şeweyên nivîsandîna helbestê hene, ji bilî rêzkêş û terazûyî, heye helbesta serbest û heye helbesta pexşane û ev jî ne ji mîj ve hatiye holê li herêma me, bi teybet ji nivê pelîska bûrdî de, angî ji salên 1950î û virde.

Helbesta nûjen: Ew bi xwe tevgerêke nû ye li cîhana helbestê, ku helbest dakeve ji bilîndîya xwe ji kêş û bendên xwe, bi tiştin rojane mijûlî bibe. dibêjin ku Qedrî Can bi vî şewî hin helbestên xwe nivîsandin wek Rewî di pirtûka xwe -ya bi zîmanê Ereblî(Dîroka Toreya Kurdî ya Nû)- de dibêje di rûpelê 79an de:

لە زۆل من خراج عن سلة التقلید، وانه
زۆل من كتب الشعر الحديث في سوريا،
ولرثما بعد الأول من بين شعراء الأكراد
قطعة... من ص 79
Lê ew nûjenî serbest an pexşane bû, Rewî tenê dibêje: وهو شاعر التجديد في شعرنا
الكردي. Lê em dixwazin rewşa van herdu beşan ji hev cuda bikin, helbesta serbest kevnîre ji helbesta pexşane, rîsta wê bi awakî teybet û xweser tî nivîsandin. Helbesta serbest: Ew e helbesta bê kêş û

bê terazû. bê pêlawaz û bend be, Lê bi ritmeke li hevhatî her çend rêzan. helbesta serbest li ser destê Walt Waytman (1819-1892) yê Emrîkî hatiye nivîsandin, nexasim di pirtûka wî helbestî (pelên geya 1855) de, piştî hin helbestvanan din jî yê navdar mîna: Izra Pawnd, T.S. Elyot nivîsîn.

Seydayê Keleş ji helbesta nûjen re digot (helbesta serberdayî). Angî bê hevser e. 2. Helbesta pexşane: Ev helbest xirû pexşane ye, lê bi wêne û mînak e û hesan e, helbesteke rojane ye tîjî raz û sawîr û mat e... li ser destê pexşember helbesta nûjen-afîrî Arser Rambo (1854-1891) yê firensî Yê di temenê 17 salî de dest bi vî nûjenîya nivîsê kir. Di dema 4-5 salan de... 44 perçe helbest û du pirtûk weşandin, yek: (palek ji dojhê) û (ronak)... Ev berhem ji helbestevanan re bû Encilî û destûra bîngêhên nivîsandîna helbestê, ku pir helbestvanan xwe tî de dîtin. Çimkî bi wêneyan tîr bû, bi raz bû û dûrî warê kêş û rêz-bendên helbesta kevnêsope bû.

Helbesta Kurdî: Ev helbesta nûjen nuhbûnek xist mijar û naveroke helbestê, gelê me jî pênuşa xwe amadekir vî pêşveçûnê sazbike ji xwe re, tev helbesta cîhanê bibe angî bifire asteke din, rojane, tevayî, ku bi wêneyên çak û rengin daxîne ji bilîndûna kesane nav gelê her kesî.

Wekî me li jor gotiye, yê pêşî ev helbest nivîsî bi Kurdî, ew Qedrî Can bû, çimkî beşeke nûjen bû ji hêlekê ve û hesan bû jî ji hêleke dî ve (weke hin

helbestvanan dîtin) nemaze kuçandawan Ereblî bû, ew dagîrkirê welatê Kurdan. Ji vî yekê ketin bin bandora wan, weke çawa Ereblî ketin bin bandora wegera Ingilîz û Firensîyan de, ji ber xwendîna wanî li mitolê wan bû. mîna Elî Ehmed Baksîr li dûmahîya salên 1940î li Misrê, nexasim di nivîsîna şanoka xwe ya bi navê (Şikîspîr) de, tev ezmûna Liwîs E'wed xuya ye li gasîna nûjenîyê, nexasim di pirtûka wî de ya bi navê (Bîlotoland û helbestin din) di sala 1947an de, di dema dawî de, hat nasîn ew nûjenîya helbestê di navbera Bedr Şakîr Alseyab û Nazîk Almelayîkê de, helbesta Seyab ya hate nasîn bi navê (Ma evîna bû? هل كان حبا) û ya Nazîk (Kolêra-كوليرا). Birastî min navê ez pir bi dû kevîm, lê divê bi kurtî bêjim, ku wan xwest jî ezmûna helbestên Ewropîyan sode bigrin.

emê vegerin helbesta Kurdî ya nûjen.. belê, pir kesên mijûlî toreyî Kurdî û nemaze helbest ku bi hesaniya vî şewî xwestin helbestan binivîsîn, lê mixabin tînegîştin, ji ber bi sivkayî destpê kirin, didîtin ku peydakirîna çend rêznivîs û rêzkêşan dibe helbest û hew, ku wîsan helbesta nûjen dinivîsîn, ji ber xaka toreyî Kurdî bor bû, pir tov lê tîne çandin bi hesanî. Em nabêjin çîye naveroke, bi wêne ye, bi huner û wate ye, an lihevhatî ye û lihevbadayî ye.

Bi rastî wîha berde-wam kir ta pir hevalan dest bi çapa pirtûkan kirin di dema heştîyan û notîyan di sedê bîstan de. Lê mixabin helbesta serberdayî dinivîsîn.. ne serbest û ne pexşane lê cuda ji herdu beşan, an jî herdu tevî hev in. Belê, helbesta nûjen

ne tenê ji rêzkêş û terazû û hespane ket, lê ji naveroke xwe de jî hat ketin û guhertin. Ji bo sûdenasîne û zanîna kesên li kasîne, emê navên helbestvanên hirêma Kurdî li rojavayê Kurdistanê bînin zîman, weke ezê nimûnakê bidim xuyakirin, lê ji pêşî de ez lêbûrîne dixwazim heger min hin helbestvan jîbîr kirin û navê hinan berî hinan hate pêkanîn, ji ber ev ne Antulociya ye ez dijîmêrim û darvedîkim, tenê li me em nûjenîyê nasbikin di gîra navê kesan de.

- Efrîn: Nezir Palo, Axîn Welat, Kamîran Bêkes, Merwan berekat. - Amûdê: Ehmed Huseynî, Royarê Amedî, Şerîf Gêlo. - Dirbêsi: Xemgîne Remo, Fethulla Huseynî, Arşevê Oskan, Hoşeng Osê.. û Ciwanê Ebdal. - Şam: Dîya Ciwan, - Dêrîk: Evîn Şîkakî, Melevan Resûl. Kemal Necm. - Heseke: Ezîz Xemcivî, Mehmed Badîlî. - Kobanê: Can Bapîr, Jana Siyda. - Qamişlo: Konê Reş, Ferhad Içmo, Ferhad Çelebî, Dîldarê Aştî, Mihemed Şexo, Silêman Azer, Rîzo Xerzî. Bi zîmanê Ereblî jî xweş dinivîsîne: Ibrahîm Yusîf, Taha Xelîl (tevî bi zîmanê Kurdî pirtûkek çapkirîye van çend salên dawî). - Serê Kaniyê: Cegerbîrîn, Hozanê girkundê, Dîlan Şewqî, lawkê Hacî, - Tirbespî: Tengezar marîni, Li min bibûrînin, ku ez nişfên nû xweş nasnakim, lê hin helbestvanên nûjen bala min kişandin mîna: Ciwan Nebî.. Hekîm Ehmed.. td. Belê, me xwest gasîna helbesta nûjen bi kurtî bînin ber çavên xwe û xwendevanan.

Çendî tişt derbas dibin bêyî em li wan rawestin Kurteçîroka kurdî ya nûjen, (Qolinc) wek mînak



Ebas Mûsa

Çîroka kurdî ya dapîr û bapîran mîjî û xeyala kurdî tîje kirin bi deverên bêsînor, çîrokên acenîyan û pêlawanên ku ne diketin û ne dimirin, mîna rustemê zal, û herwiha çîrokên evîni mîna memûzîne...hd

Bi sedê salan vî çîrokê civat dadîdan û şevbuhêrîk derbas dikirin.

Kurteçîroka nûjen weke her tiştên nûjen hêdîhêdî derbasî jiyana kurdî bû, lê vî carê bi rengekî dîtir, ku ew çîroka kurdî ya kîlasîk - heger em vî navî lê bikin- jî cotkar û karkeran re dihat gotin û jî mir û paşayan re, lê çîroka nûjen û bi taybet a kurt, jî nêv civata jêrîn derdikeve, lê ne jê re tî xwendin. Zîmanê kurdî di dirêjaya temenê xwe de, piraniya vî devkî bû, û ta dema ku hat nivîsandin bi rengekî nû ku karibe rengekî serdem bide mîletê kurd, hat dorpêçkirin ji hêla dijîtiya hebûna kurdî wekî mîletek xudan netewek cuda û çandek hevbeş bi mîletê derdorê.

Ew tiştê ku hatin nivîsandin beriya niha, bi rengekî teng hatin xwendin ji hêla rewşnîrî û nivîskarên kurdî nivîsî ve.

Bi rastî jî emê nikarin ser çî nivîsîna kurdî rawestînin, bêyî ku em pîrgîrêka zîman bînin holê, nemaze nivîsîna nûjen, jî ber ku nivîsîna nûjen ser rîsteke bilîndî dileyze di zîman de, û jî ber ku ew nivîsîn gaveke li pêş e, li hember xwendevanên zîmanê kurdî yê ku roj bi roj pir dibin, piştî ku bîhnedan gihîştî wan.

Kurteçîroka nûjen û jiyana kurdî

Em dikarin bêjin ku kurteçîroka nûjen weke kîrasê hevîrîşimî ye, ewê ku feqîr hevîrîşimî we didin hev, û hostayek angî nivîskarê zane dihûne û dîde xwendevanan da li xwe bikin angî bixwînin, lê ev nivîsandin ew e ya dikare bi hûrbîni jiyana kurdî ya sîkolocîk û sîsyolocîk bişopîne, û dikare şîkestînen nediyar bide xuyani bi rengekî zîrek.

Jî ber jiyana kurdî di çîroka kîlasîk de tim pinekîrî bû, bi pêlawan û mîrên nemir, ew şîkestîni di kesayetiya kurdî de, ma di paşgotînan de, carcaran tiştin diyar dibûn di dengbêjî, sitran û çîrokan de, û gelek caran veşartî diman.

Kurteçîroka kurdî ya nûjen heger tiştê mezîni jî wêjeya kurdî ya devkî ya zengîn bîrîbe, lê reng û kîrasê xwe ji nivîsîna welatên Rojava aniye, ne tenê tîpên wê, lê guhdana wê li hûrbîniyên jiyana sîkolocîk û sîsyolocîk, û xweşîkbûna nivîsîne û gîredana girêk û hûnandîna kurteçîrokê.

Kurteçîroka kurdî û girêka kor Di navbera kurteçîroka nûjen a ku mercin wê yê taybet hene - da ku karibe biglîheje rêza cîhanî - û çîroka kîlasîk gelek girêkên kor hatin gîredan, û hin nivîskar ketin concala di navbera herduyan de, û nedikarin çîrokek rengekîlasîk binivîsîn da were gotin bi devkî, û ne jî karin kurteçîrokek nûjen binivîsîn, ku karibe jiyana kurdî bişopîne, bidin dest cîhanê bi rengekî nivîskî.

(Qolinc) û jiyana jêrîn

Qolinc kurteçîrok in, kurdî ne, bi nivîsandîna nivîskar Xoşman Qado, ev çîrok rengekî mirovayeti divedin, gotubêjek di vî kurteçîrokê de heye ku dibêje (em bi kurdî jî dikarin jiyana tiştan û canewer û mirovan bişopînin). Kurteçîrokên Qolinc bi kûrayî di kevîni jiyana mirovan de, bi rengekî ku dihêle çî mirov karibe bi wî hestî bîjî, mîna çîroka Toza sipî, ya ku ser mijara mirîne di axive bi rengên xwe yê fantastîk, ku

bêjer - pêlawan ew e yê hebûn û nebûna xwe dibêje, û rengê sipî dîde wek tayê dinavbera jîyan û mirîne de, ew tayê nazîk yê ku tenê nivîsandin dikare ser raweste, û hestên wê tevheviyê bike wêne.

Di çîroka bi navê We ez naskirin jî Xoşman Qado di keve nêva sîkolocîka ciwanekî de, ku qerebalixek di nêva wî de heye di navbera jîyan û nejiyanê de, dîse çîrok rengekî mirovayeti vedide.

Bi hûrbîni mijarek civakî di civaka kurdî de tî şîrovekirin, ew jî di çîroka Nanê kevîni de, a ku nêzîkî sîkolocîka kurdî dibe û bersîvek abûrî dîde meseleyeke ku civakê kirasekî olî lê kiribû.

Herwiha jiyaneke heye li jêr e, bi me re ye, lê em kêr berê xwe didîne, jiyana tiştên jêrîn, Xoşman karîbû nêzîkî vî jîyanê bibe, bihêle hestên me bihejin bi aliyên jiyana me ya din de, ya ku bi me re dimeşe, bêyî ku em bihnekê lê rawestînin, mîna çîroka ketin û ya kefçî, ev çîrokên bi vî rengî dihêlin em carcaran li jiyana xwe vegerîn, û rengan baş bibînin, nemaze di vî jiyana bîlez de, ya ku nahêle ku mirov xweşîk tiştên hûr bibîne bi çavekî mezîni.

Qolinc bi 13 çîrokan qabê xwe digre, lê gelek pencereyan vedike da ku em bi çavekî nû li jiyana hawîrdor meyzînin, û ew tiştên ku derbas dibin bîlez digre bi rengekî zîrekî.

Hêlan



Xoşman Qado

Kiro law hew herin û werin, we ev der giş gemar kir, herin biqêştin ji xwe re li derve bilîzin, axx...xwezî ev herdu rojan ji hûn çubanan dibistanê.

Bi vî awayî Dê dikir birebir, kirasê xwe jî hildabû newqa xwe û xistibû ber wî benê ku lê girêdabû, bi destekî xwarin çêdikir û bi destekî kinc li ser têlan radixist.

Di wê cadê de xaniyan pala xwe dabûn hev û sîka xwe di bin lingên zarokan de rastdikirin, ji nişkave deriyek ji zikê xaniyekî vedibû, ew û birayê wî yê jê biçûktir bilez jê derdiketin û dengê hewşê bi dû xwe ve dikşandin derve ta tevî wan zarokan dibûn.

Gok li bin guhê diwar diket û di nav wan de wînda dibû, du zarokan xeber ji hev re didan û hinkan jî qerfên xwe bi kincên hev

dikirin, wilo qerebalixa cadê xwe di hundirê zarokan de belav dikir.

Yekî ji wan xwe qeherand, kumê xwe xist destê xwe, û bilez berî da malê, û yekî din dikir û nedikir nikaribû qeytanê sola xwe girêdaba....

Nanek li hev pêçabû û di destê xwe de zeft kiribû, kum li ser serê xwe rastdikir û bazdida nav zarokan û bihna ava Bacana li ber pozê zarokan dixist, wan zarokan jî di bin çavan re li destê wî dinêrin bê çawa wî nanê dixê devê xwe, û gepek jê qut dikir.

Li birayê xwe, li zarokan nêrî û hêdî xwe vedizî û çû malê, rasterast berê xwe da avsarê vekir û destê xwe dixist kîsekî, mozek jê derdikir û bilez bazdida derve, dît ku zarokan dest bi lîskê kirine, moza xwe xist destê birayê xwe û xwe berda lîstikê.

Birayê wî bikêf bang wî kir:

-Ez ji xwe re qetekê bixum.

Birayê wî di cihê xwe de rawestiya û jê re got:

-Naaaaa...

kêfîkekê ma û paş re jê re got:

-Ji xwe re mijekê lêx.

MAM



Anahîta Hemo

*Xam sermest e,
Mamê gelê kurd e
bimîne ji kurd re,
xoşhalî ye,
Mame,
bi rê kirin kerwan
bi nîşên kurd re,
sewze geş e,
niqar dimen e,
ahenga dilê min e
taybet e, ji başûr e
rizgar e, Rojava dinale
kalîn e, halan e,
feryad e, sed ax ax e !!!*

*Ta rojavayê Kurdistanê
şadiya me bi deyx ke,
Mam dengê xweda ye
stêra nexşa rojhilat e,
Qamişlo zeredexene,
hêstirên Şahiye!
de bibarin...bibarin,
Buhara xoşhalîye,
de geş be yabo,
di aramgeha xwe de,
ramanên te vejînin.
Dara te şîn e.*



Hekîm Ehmed

*Min dî sipîdê xemilî
Kesk û zer û sor û gulî
Sîngê ji zêran kir gilî
Hatîna sema bisk û gulî
Agir te berda vî dilî
Carek xwe berde vî milî
Hewran ji ber rojê hilî
Rûne di nêva pencerê
* malîkek ji helbesta seydayê Cegerxwîn ya bi wê navnîşanê di dîwana wî ya sêyem de hatiye.*

***Dawîya piyalê:** Navnîşan ne tenê girêdayî naverokê ye, lê ew kîlîta helbestê ye, li ser wê heyama rewş û hestan amade dibe. Dawîya piyalê navnîşanê dihêle xwêner têbigihêje ku Cegerxwîn di dema çêkirina wê helbestê de pir hestiyar bû di dawîya şeveke bê xew de mest bûbû, ev rewş pir lihevhatî ye bi afirandinê re, ji ber wê xwêner pêşbîn dibe ku wê li helbesteke astbilind guhdar bike.

***min dî sipîdê xemilî:** mîna navnîşanê ev rêz radije tiştê nehatiye gotin (tiştê berî sibehê). Cegerxwîn ji destpêkê ve çavên xwe dide xwêner û wî vexwendî dîtîne dike (min dî)

Dawîya Piyalê

û dîrî piraniya helbestên kurdî yê reşbîn, xwêner dikare bi Eza Cegerxwîn û çavên wî sibeheke bi xeml û ronî bibîne.

***Kesk û zer û sor û gulî:** hestên Seyda bi rengê sipîdê yê sipî tîr nebû, ji ber wê rengan dike rêz, dihêle xwêner bipirse: gelo ev reng yê çî ne? Yê xuristê ne? Yê lîv, dem, por û riwê yarê ne? Yan jî ew rengên netewî ne di hestên afrêner de tevî evîne bûne? Bêguman ew reng çawa bin berî her tiştî yê hesta Seyda ne.

***Sîngê ji zêran kir gilî:** reng berdeyam dikin (sîng, zêr) lê wê carê tev lîkerekî (kir gilî), ew lîker dihêle liweke kelgerm bikeve hestan piştî rêza borî ya navane ku aramiyek dida hestan.

Di demê dirêj de yek ji pîvanên çelengiya zeriyan piraniya zêran li gerdenê bû, li vir jî sîng dike gilî ji giranî û piraniya zêran.

***Hatîna sema bisk û gulî:** bi beşdariya porê rengê wêneya Cegerxwîn diyartir dibe, tevger û kêf (hatîna sema) di mîhrecana Seyda de gur dibin. (gulî) jî du caran bi watene tîvel bikar hatiye, di rêza diwem de rengê bû, lê di ya çarê de pora hûnandî bû, ev jî şeweyekî afirandinê ye ku mûzîka lihevhatî dide hevokê.

***Agir te berda vî dilî:** hîna Cegerxwîn şewekariya xwe bi dawî nekiriye, jiber me digo piştî sîng û porê wê rû bû, lê vîketina eşqê ew neçar hişt ku bang bike. Di

wê hevokê de bireser berî kirarê hatiye, ev li ba zîmanzanan ne şeweyekî resen û gelemper e, lê sedema wê jî pêdiviyê wateyê ye, jiber tiştê balkêş û girîng (agir) tê pêş çimkî wê kêfîkê ew bêjeya nêzîkî hestên afrêner e.

***carek xwe berde vî milî:** rasterast Cegerxwîn tîkîliyê û nêzîkiyê dixwaze li (vî milî) ango vî alî.

***hewran ji ber rojê hilî:** kîjan ewr? -Bisk û gulî li pêş çav in? -perde ye li ser pencerê? -ewrên birastî li pêşiya rojê ne? -mja mest-bûnê li ser çavên Cegerxwîn e? Yan jî ewreke razber e tê wateya Seyda û yarê ji hev dûr dike û nahêle ku hev bibînin.

***rûne di nêva pencerê:** dawîya movikê di helbesta klasîk de, xwêner yan guhdêr dibe asteke hestbilind û jînişkave tiştine nediyar diyar dibe, li vir wêne tekûz dibe, lîkera fermanî (rûne) radije lave, lavij û xwestekên helbestevan û belkî mebest ji (rûne) raweste yan aram be (di nêva pencerê), lê wek em zanin pencereyên hin xaniyên berê rîya rûniştinê têde hebû.

***Li dawîyê emê dîse bipirsîn:** gelo Cegerxwîn wê sibehê çî dît? -roj li paş ewran dîtiye weke yareke li paş pencerê, yan yar dît li paş pencerê mîna rojê li paş ewran?

Pirtûk Dibe Tu



Merwan Berekat

Dema ku... pirtûkekê dixwînim li pêş çavên min xêz dibin mijangên te yê tîrkîla û xewna şevên sêwî bi wan mijûl dibin. Tîp dibin.. wêneya kenê te bêzariya dil koçber dikin. Bêje dibin... awirên çavên belek rewanê min serxweş dikin. Xal dibin.... şana li dêma te ya rastê tajanên ramûsanan ew li ser lîvên bîrveçuyî siwar dibin. Hevok dibin keziyên te yê bi hêviyan hatine hûnandin ew min dikin.. wek nêrîneke serxweş û bêşop... di rûpelê de didelim hemû xal, bêje, hevok û xêzan bi coşa ramûsanan.. ez mor dikim.



Dilawerê Zengî

Rewşa gelê kurd ya jeopolîtîkî û dabeşbûna wan, kiriye ku rewşa helbest û toreya Kurdî bi giştî wekî rewşa ramyarî û civakî be. Temenê toreya Kurdî, ne kêmîrî deh bebilîskan e. Ji dema mîretiyên, ji babîlîskên navîn, ta bi dawîya babîlîska nozdehan ve, xwe dirêj dike. Ev dîroka dîr û dirêj, di çend qûnaxan re derbas dibe. Gopîtkî yekemîn di dema babîlîska dehan de, bi serkêşiya helbestvan Baba Tahîrê Hemedanî, xwediyê çarînan e. Ev helbestvan xwediyê pîtolî û zanyariya yekîtiya jîwerî (Kozmosî) ye. Bi raman û hizra yarî ya xwe, di Xweda û xweberiyê de dihingavt. Gopîtkî diwemîn di babîlîska panzdehan de bi serkêşiya mele Ehmedê Cozîrî ve tê xuya kirin. Ev helbestvanê

Rewş û qûnaxên Helbesta Kurdî

Kurd yê pêşî bû ku helbesta (xezeli) ya Islami derbasî toreya Kurdî kiriye û nuhtî ye. Gopîtkî siyemîn di bebilîska hevdehan de, di çîroka navdar (Mem û Zîn)ê Ehmedê Xanî de, diyar e. Tiştê balkêş, ko di wê demê de, li Ewropayê, ji bo olî û dêrê Kasolîk û Pirostîstanî hevdu dikuştin(1). Lê, li Kurdistanê dengê zengilê hişyarî û rizgariya gelê Kurd li ser destê Xanî xweş dihat. Di babîlîska nozdehan de gopîtkî kilasîkiyeta nû di berhem û nivisandinên helbestvan Nalî, Salim, û Mustefa beg de tê nuhtin. Ev kilasîkiyeta nû ji bo rizgariya neteweyî jî dihat bikaranîn. Nemaze, di navîna dawî jî babîlîska nozdehan de li ser destê helbestvanê mezin Hacî Qadirê Koyî. Ta bi vî rojê, ev şewê, di nav helbestvanên Kurdan de tê bikaranîn. Helbestvanin mezin di vî riyê de diyar bûn û navê wan di ezmanê helbesta Kurdî de geş bûn. Ji şerê cihanê yê yekemîn ve helbesta nûjen linik Kurdan dest pê bûye. Li gorî baweriya min, ew jî di çend qûnaxan re derbas dibe: Qûnaxa yekemîn di nebera herdu şerên cihanê de, bi serkêşiya Kamîran Bedîrxan, Qedîrî Can,

Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran xuya dibe. Ev nuhtin û nûbûn linik her helbestvanekî ji yê din cidahî heye. Ango linik hin helbestvanan nuhtin û nûbûn di warê zîman û şikandina benda kêş û bareyê de ye, linik hinin din, nuhtin û nûbûn di naverok, raman û hûnandinê de ye. Herweha linik hinin din nuhtin û nûbûn di zîman, naverok, raman û kêşesaziye de ye. Hêjayî gotinê ye, ko berî herkesî yê helbesta nûjen nivisandîye Dr. Kamîran Bedîrxan e". Qûnaxa diwemîn piştî serhildana tevgera Ruwange bi serkêşiya helbestvanê mezin Şêrko Bêkes e. Manifestoya Ruwange, ji bo tazekirina helbesta Kurdî hawarek bi serê xwe bû. Mirov dikare bibêje ku ev manifesto digel nûkirin û azadiya helbestê, nûkirin di zîman, raman, çîrok û nêrinin nû di civatê jî de bû. Piştî vî tevgerê, qûnaxeke nû, li ser destê çend rewşenbîrên Kurd mîna: (Ferîd Zamdar, Enwer Mîsyefî, Kerîm Deştî, Dilşad Ebdîle, Ferhad Şakîlî û Letîf Hilmot.....htd) xuya bû. Evan rewşenbîran bi nuhbûn û nûxwaziye bang kirin.

Di nav Kurdên Sûriyê de dest bi nivisandina helbesta nû bûye. Kelandinek li ser pêmayên mîrê ronakbîran Celadet Bedîrxan, Dr. Kamîran Bedîrxan, Qedîrî Can, Cegerxwîn, E. Namî, Osman Sebrî, Ehmedê Şêx Salih û Tîrêj heye. Hin xortên nûhatî bi şeweyên nûkirî, dixwazin dest bi hûnandina helbesta kurdî ya nû bikin. Di hin helbestan de çîriska hêviyê dibînim. Lê neyê hevotin ku helbesta nûjen cihê xwe li nav me girtiye û bûye mîna helbesta kilasîk, xwedî dibîstaneke serbixwe. Uşt û sedemên vî yekê pir in. Derd û kulên me jî gelek in. Ev cih ne cihê serseknandina wê yekê ye. Tenê tiştê balkêş ev e: Reh û çav-kaniyên helbestvaniya van kesan, yan ji çavkaniya helbestvanên Erebb, an jî helbestvanên biyanî yê ko helbesta nûjen nivisandine, werdigrin û rîya wan dişopnî. Mexabin, di bin bandûra peyrewî û hevenda vî diyardekê de mane û li ser vî riyê mane. Hin jî hene bi zîmanê biyanî (Erebî, Tîrkî, û Farisî...td), diramin û bi kurdî dirvisînin. Helbestên wan bê sude, bê

fesal, bê serûber, xav, kerik û bê hawe ne. Giyanekî bê can, balayekî bê per û bask û sirûdekî bê awaz in. Rast e, merov nikare şîretan li helbestvanan bike. Lê merov wek xwênerê dikare nerîna xwe di helbestê de bide. Xwendina helbestê ji mirovekî ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwediyê (afrandekê) helbestê bixwe, piştî çend xwendinan, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sinora gotin û şorzarên de nayê bestin, û ne jî tê hevragirtin. Ji ber ku zîman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweberî de jiber bike. Divê tîkîliyeke giyanî di navbera xwendevan û helbestê (pîrsur û pîrsurî) yê de hebe. Helbest, ne diyardeke sekîni û bê liv e. Ne jî dîtanîyeke ekadîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî di cihana peyv û gotinan de digere, û jiyaneke sermedî ye. Di pêşketin û nûkirina raman, hizir, zîman, huner û civakê de roleke mezin dilîze. Helbest deryake ji evîna bê dorpe û sinûr e. Bê rawestandî û miçiqandin, dizê û diherike.

* Li kovara (Hawar)ê vegere.

Awayên Dûrxistina Nakokiyên Ciwanan Bi Malbatê Re



Gelo nakokî û pirsgirêk di mala te de çêdibin? Ma ev nakokî te dêşînin û reşbîn dikin? Ne xemgîn be, ji ber ev rewşa piraniya malbatan e, di vê mijarê de pispora pirsên malbatî Rênê Balkom 5 şîretan dide me ji bo çareseriyê.

1. bibihîze û ne nerxîne: bi malbatê re bi aramî bipeyive, eger mijara hevpeyvinê li ser te be û tiştê te gotin li te nexweş hatin, gotina xwe kurt bike û li her gotinekê nevegerîne, ji ber tê li vir pir hestiyar bî, tê bêhteng bibî ji gotineke biçûk çimkî mijara hevpeyvinê tu ye.

2. têgihîştî be: hewl bide ku tu kesayetiyên malbata xwe nasbikî, da tu karibe tast têtîghêjî li ber nerîn û kiryarên wan, ev dihêle tu wan bipejirîni û win dijberî hev ne sekinin.

3. razên wan belav neke: gava yek ji malbatê tiştêkî xwe yê taybet ji te re got, neçe ji kesekî din re ne bêje, ji ber vedana razan di nav endamên malbatê de, wê bihêle ku nakokî pir bibin û bawerî kêm bibe.

4. pirsgirêkan hembêz neke: bi gelemperî nekeve nav nakokiyên di navbera kesên malbatê de, ji ber tu tu sûdeyê ji vê nagirî, lê belkî cama tu xwe bavêjî nav nakokiyekê û encam neyînî be, li dawiyê wê loman ji te bikin û te sûcdar bikin.

5. malperwer be: ji bo tu duri nakokiyên bikeve, divê tu bê merc û pêşbînî ji malbata xwe hesbikî, ji wan hes bike ji ber ew nêzîktirîn kes ji te re ne, lê pir geşbîniyan bi wan ve girênde, da hêviyên te bi wan re têtî neçin, bese ku li nik te bin û bi tenduristiyeke baş bin.

Gelo Siyaset Li Ba Keçên Nûhatî Balkêş e?

Hîna jî destpêka ciwaniya keçan qunaxa tawankirinê ye, ji keçê re dibêjin: bêhiş, kelgerm û bê berpirsyarî, tim li dû mode, kovar û nûçeyên hunerê dikeve.

Pir ji keçan van gotinan li xwe nexweş tînin, wê qonaxa sereke ji jiyana xwe dibînin bîngeheke girîng ji bo avakirina kesayetî û çanda xwe.

Hin ji van keçan nasîna wan bi pirsgirêk û dozên siyasî heye û nerînên wan yê taybet jî di van mijaran de hene.

Îman (14 salî ye) dibêje: ez siyasetê û nûçeyên wê dişopînim, bi bavê xwe re dikevim hevpeyvinan de li ser mijar û aliyên cuda di siyasetê de, kenalên TVê yê nûçeyan dişopînim, ew dihêlin ez çihanê tevî bibînim û kesayetiyên wê nasbikim, li gotin, şirove û nerînên wan yê kûr guhdar dikim û kêfxweş dibim çimkî arîkariya min dikin ku ez kesên dora xwe nasbikim. Ez pirtûkên dirokê jî dixwînim da ez nasbikim çawa guhertin çêdibin di demaşoreşan de.

Mekiye (18 salî ye) dibîne ku: şopandina siyasetê bi xwe ne baştirîn meroqe li ba keçên nûciwan ji ber piraniya wan duri van mijaran e, lê di nav demekê û demekê de bûyerine balkêş çêdibin.

Tesbîh (15 salî ye) dibêje: mijarên girêdayî bi miletê me û şoreşên wî ve ez dişopînim, eger mode me bikêşîne jî ev ne dijî ku mirov mijûl bibe bi mijarên jiyana rasteqîn.

Amal (14 salî ye) tersî wan daxive: na, ez nûçeyan naşopînim û tucaran kêfa min ji pirtûkên siyasî re nehatiye tevî ku belkî sûdeya wan pir hebe, lê ev naye wateya ku bûyerine taybet bala me nakêşin.

Li dawiyê Nûrhan (13 salî ye) dibêje: ez gotarên siyasî kêm caran dixwînim, têtîghîştin di siyasetê de dihêle em nasbikin kî rast e û kî şaş e, lê tiştê pir bala min dikêşîne kesên gewre yê ku kiryarên lehengî dikin, ew kes hêjayî ku em wan jibîr nekin.



Du Guh û Zimanek

"Xwedê em bi du guhan û zimanekî afirandî, da em guhdar bikin bêhtir ji ku bi-xavîm." Sugrat

Guhdarkirin awayekî navgîniyê sereke ye, alava wê jî ziman e, bêtir wê em nikarin nameyên kesên derdora xwe werbigirin, ew nameyên radijin hest û ramanên wan, lê tiştê girîng ew e ku tu nikarî rêzgirtinê ji derdora xwe bistîni bêtir ku tu guhdarêkî baş be, dibêjin: guhdarê baş axêverekî baş e.

Mixabin pir kes di civaka me de hene rahtîne çandêke çewt, ew di wê baweriyê de ne ku tu çiqas bîaxivî û kesê din yê pêşberî xwe ji axêver bike guhdar ji xwe re, tu ewqas zane diyar dibî. wilo em di civatên xwe de dibînin deh bi hev re dipeyivin, yek jî dengê yê din nake.

Lê Can Cak Roso (feylesûfekî Swêsrî ye) dibêje: Xelkên hindîk zanin pir diaxivin û yê pir dizanin hindîk diaxivin. Bêtir ji wê jî cama kesê din dixwaze li ser nerîna axêver-

ekî tekez bike, lê mixabin dikatorê payebilind rê nade ku ev gotûbêj bigihe li-hevhatinekê yan amanca xwe (navgîni û nêzikirin) pêk bîni, ev jî jê xirab e. Ji bo em bi wê janê nekevin, divê em zanibin ku mebesta her axaftinekê girêdana têtîkiliyê ye, ev têtîkili jî du alî jê re divin, gava tu li aliyê din guhdar bikî bi rêzgirtin û guhdan, tevî hin alavên xurtkirina têtîkiliyê wek (berken, hejandina serî û erêkirin bi çavan) bikar bîni, tê encamine bi sûde wergirî, ji ber tê baweriyê ji hevpeyve xwe bistîni, tê wî amade bikî ku ew jî ji te re guhdarêkî baş bî, ya herî girîng jî ku wê encam yan çare ji mijara axaftinê re hebe, di rîya bandor û pejrindina nerînan ji her du aliyên.

Li dawiyê, tu nikarî pendyar û zanyarekî bê guh bî, ji ber zarokê jî bi balkêşî û bi rastî li te guhdar nakî, eger tu lê guhdar nekî.



Zahid Mehmûd

Di texmîna min de, di çî mijarê de be, gava tu bi pirsêkê destpê bikî, wê derfeta sûdegirtinê û serkeftina amanca wê gotarê erênî be, lewre ez jî dixwazim bi pirsêkê destpê bikim ew jî ev e: Gelo çî kesekî ko hewlîde ko pênuşa xwe bikar bîne, raman û hastên xwe biguvehê berhevokekê bide, çirokan bide hev yan romanekê bihûne, di heman demê de parastina zimanê xwe yê dayikê û tîpên wê bike erkeki kesayetî, ma ew nivîskar ne ji mafê wî ye ko bi dilekî bê westan berhema xwe çap bike, di derzekê jî derzên diwarê bêdengiyê û piştguhkirinê re derxe rojeva civaka xwêneran û roniyê bide nerîn û afirandina wê berhemê. Nivîskar tim mijûl e di mejî û dilê xwe de bi pirsê: wê ev karê di nav destê min de çap bibe yan na? ev jî dibe barek li ser bare wî yê sereke (afirandin). Ji alîkî din ve pirsêkê din wî mijûl dike, ew jî girêdayî

Pirsgirêka Nivîskar

pêşwaziya xwêner û rewşenbîran ji berhema wî re, erê ev xem bi piranî girêdayî nivîskar e, lê aliyek jê jî girêdayî berg û asta çapê ye û li dawiyê encam û rexne, wê berê xwe bidin nivîskar, di nerîna min de divê xwendevan bi nerîn û helwestên xwe, di rexnekirin û nirxandina berhemê de rola xwe pêk bîne. Bi vî hawî, em dikarin bêjin ko xema herî mezin di hembêza nivîskar de, derçûna pirtûka wî bi rengekî paqî û pejrindî, wilo nivîskar bi wê pirs-girêkê xemgîn dibe, nemaze ew nivîsandin pêdiviyên wî yê rojane peyda nake. Li dawiyê, pirsgirêka dimîne li holê nebûna sazî û dezgehên ko wê ustûbariyê hilgirin, destê yarmetiyê di çapkirinê de dirêjî nivîskaran bikin û li wan xwedî derkevin wek erkeki netewî, nemaze nişên nûhatî yê dilê xwe ji çand û zimanê xwe re vekirine, da em nemînist heyranê partîtiyê, lê belê bibin hezkiriyê peyva kurdîtiyê û em li hev xwedî derkevin.

Di yekemîn Roja Dayikan a Mulkiye de çalakiyek ji bo wê

Mulkiye Demir Kiliç ku diya du cewiyên biçûk e wê ligel du cewiyên xwe bikeve girtgehê. Komeleya Mafên Mirovan ji bo piştgiriya Mulkiye Demir Kiliç di yekemîn Rojê Dayikan a Mulkiye de çalakiyek li dar dixe. IHD'ê daxuyaniyekê weşand û got: "Em li sinorê ku gotin lê xilas dibe ne... Ji bo Mulkiye em bi bêdengî rûdinin." Çalakiya rûniştinê 11'ê wê mehê saet 14.00'an de de li ber Lîseyaya Galatasarayaya Beyoglugluya Stenbolê lidar bikeve.

Mulkiye Demir Kiliç hatiyê vekirin. Ji bo dema li Navenda Çanda Mezo



potamyayê dixebitî li beşa pirtûkxaneyê dinêrî û pirtûk difrotin. Di dema ku pirtûk firotine de kesek pirtûk girtine û ji bo rêxistinê şandine. Ji ber pirtûkan Kiliç ji endamtiya rêxistinê hatiyê darizandin û di dawiyê de 2 sal û mehek cezayê hepsê lê hatiyê birin. Û niha du cewiyên wê yê 8 mehî hene. Ger di kêliya dawî de tiştêk neguhere Mulkiye Demir Kiliç ligel cewiyên xwe de bikeve girtgehê.

Ji bo piştgiriya Kilint kampanyaya îmzeyan ji hatiyê vekirin. Ji bo yê bixwazin piştgiriya bidin:

heve girê nade ji pêvî dostaniya dayikên me. Diya min qeherî gava min ew gazin jê kir, min çiqas xwest ez zorê li xwe bikim lê min nikaribû ez hevaltiyê bi wan re bikim. Li dawiyê ez westiyam, min dev ji hevalên xwe yê berê jî berda û ez di tenahiyeke de dijim.) Ev bû nameya Şeyma keça 16 salî, mamoste Mihemed Şalan pisporê derûnê

Leyla Qasim kulîlka azadiyê ye

Ömer Özmen



Leyla Qasim; Di sala 1952 an de, li bajarê Kerkûkê ji dayikbûye.

Dema li Üniversite ya Bexdayê de xwendevan buye, wek endamê Yekîtiya Xwendevanên Kurdistanê, di destpêka ciwaniya xwe de, beşdarê tekoşina rizgarîya gele kurd dibe. (1971)

Di 12 ê meha Gulana 1974 an de, Leyla Qasim, di nav refên pêşmergan de cih digre u li d... jî rejîma kolonyalist têtîdikoşe.

Tevî hevalên xwe, di encama çalakiyek de, ji terefê rejîma Baasî ya Iraqê ve hatiyê girtin.

Di 12 ê meha Gulana 1974 an de, piştê darizandina dadgeha rejîma Baasîyê, tê dedardekirin.

Lehenga Kurd Leyla Qasim, li hember dadgeha faşîst, helwestek bi rumet nişan dide.

Bi rawestandinek biryardar, doza gele kurd diparêze. Rejîma Baasîyê mehkûm dike u weha bangê wan dike:

" Hun dikarin min bikujin. Lê, hun nikarin tekoşina azadiya gele kurd asteng bikin. Bi darvekirina min re, dê bi hezaran Leyla Qasim beşdarê tevgera azadiya gele Kurdistanê bibe."

Leyla Qasim û hevalên xwe Margeret, li ber daraxacê; bi dengbilindkirina şîrûştê Ey Reqîp, jiyana xwe ji dest didin û di nav refên şehîdê Kurdistanê de cihên xwe digrin.

Di salvegera şehîdkirina wan de; ez carekê din, Leyla Qasim û hevalên wî, bi rumet bibirînim.

Bejna xwe li ber wan lehengên Kurdistanê ditewinim.

dibêje: şaşiya dê û bavan ya mezin ew e ku hevalên zarokên xwe bibijêrin, bobelata mezintir ku ev bijartin li gor berjewendiyên kesane yê dê û bavan bin, tiştêkî din jî heye divê em hay jê hebin ku hevalê baş ne tim kur û keçên wî baş in.

Na Ji Keça Hevala Diya Min Re

Ma diya te, te neçar dike ku tu bibî heval bi keça hevala wê re. yan te azad dihêle di bijartina hevalên xwe de?

Hin dayik dibînin ji mercên dostaniyê û rêzgirtinê ye ku keça wê bi ya hevala wê re bibe heval, lê keç nerînin wan yê cuda hene, cama tersî yê dayikan û cama mîna wan. (piştî bavê min diya min

berda û yeke din anî, diya min biryar da ku li hevalên xwe yê berê vegere, nemaze piştî bavê min nema tê malê û ew kare 24 katjimêran pêşwaziya hevalan bike, min go baş e, wê hinekî bêhtengiya wê sivik bike, lê kêfa min nedihat gava digot ilêh tê bibe hevala qîzên wan, bi zorê dihişt ez bi wan re li oda xwe ya taybet rûnim, nemra telefona xwe bi her yekê jî wan dim, wilo jî

navnişana Email û fesbooka xwe. Min ji keçên hevalên diya xwe hes nekir, tersî hevalên ku min bi vîn û dibxweşiya xwe ew bijartine, hevalên min yê xwendinê û cîrantiyê, ew hevalên ku ez pir jî wan hesdikim, em demên xweş bi hev re derbas dikin, pir mijar û babet di navbera me de hene, lê ev keçên han tiştêk me bi

Dengê Qehqeha Kewên Cemal Sadûn û Dengê Zemawendên Adilê Hiznî bar kirin..



Hunermend Cemal Sadûn ku dihat naskirin li herêma Dêrikê bi rengê stranên xwe yê gelêrî û netewî, ji ber rewşa Sûriyê berê xwe dabû koçberiyê, gihiştibû welatê Bulgaristanê, li wir rewşa wî ya tenduristî pir tinik bû, li wir bijîşkan nikarîbûn wî nojdar bikin. Di 31.3.2014 çû ber dilovaniya xwedê. Cemal Sadûn ji ber stranên xwe yê netewî bi dehan caran hatiye girtin û gef kirin. Cenazeyê Hunermend Cemal Sadûn li Bajare wî, Dêrika Hemko, ku bihezaran xelkê Dêrikê pêşwazî cenazeyê wî bûn û sipartin axê.. Adil Hiznî Hunermendê herî naskirî bû li bajare Qamişlo ku ewî bi hezaran şahî, dawet lidar dixistin. Ew jî ji ber rewşa Sûriyê berê xwe dabû Herêma Kurdistanê,

di 23.4.2014 an de li Hewlêre paytexta herêma Kurdistanê, di kirîzek dîl, ku temenê wî 59 sal bû, çû ber dilovaniya xwedê.. Adilê kurê Hiznî (hunermendê gelêrî yê navdar) jî malbateke mezin û naskirî li gundê Herem Şero nêzikî bajare Qamişlo di 1955 an de ji dayik bû, xwendina xwe li dibistana seretayî ya gundê Til Şî'ra Şêxan destpê kirîye, paşê li dibistanên Qamişlo şopandîye û li hesekê amojgeh bi dawî kirîye. Di 24.4.2014 cenazeyê hunermend Adil Hiznî, gihiştê bajare Qamişlo bi hezaran hezkerên wî, heval, rêxistin, pêşwaziya wî kirin. Li gundê Til Şî'ra Şêxan sipartin axê.. Tiştê di dîl de hesret dimîne ew e ku hunermendên me piştî jiyaneke perîşaniyê li welatê xwe, li koçberiyê diçin ber dilovaniya xwedê..

Bi Bûneya 116emîn a Roja Rojnamegeriya Kurdî



Bi boneya 116'e mîn a roja rojnamegeriya Kurdî, bi amedebûna nûnerên partiyên kurdî, rêxistina Asûrî, herdu encûmen, rêxistinên sivil, kesayetiyan welatperwer û hejmarek nivîskar, rewşenbîr û rojnamevan. Komîta çand û ragihandinê ya partiya Yekîtiya demokrat a kurd li Sûriyê, li navenda xwe li bajare Qamişlo şahiyek lidar xist, tê de gotina komîtê û yek bi navê kovar û rojnameyên (Hîwar - Pirs - Newroz) û ya nivîskar konê Reş hatin xwendin, helbestên (Diham Hesen, Mehfûz Reşîd, E. Samed Mehmed, Dilbirîn) hatin xwendin, di nav re mûzîk û stranin filiklor jî aliyê her du hunermendan (Se'îd Ferso û Zêdan bavê Ferîd) û çend

perçeyên mûzîkê jî gîtara Him Bedir pêşkêş bûn. Li dawiya vê şahiyê hejmarek rojnamevan û peyamnêr û malper hatin xelat kirin ew jî ev bûn: Malpera Welatê Me, Welatî Net, komela Sobarto, peyamnêrên TVyan: Gelê Kurdistan (Ferhad Şêxanî), Ronahî (Dildar Felemez), Rûdaw (Pêşewa Behlewî), Orient (Rodî Brahîm), Kurdistan (Mizgin Gemo), ARK (Bindar Şernexî). Hêjayî gotinê ye ku bi vê boneyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê û Yekîtiya Rojnamevanên Kurdên Sûrî şahiyekê hevbeş li navenda P.D.K-S, lidar xistin, Partiya Demokrati Pêşverû kurdî li Sûriya jî ev roj li navenda xwe lidar xist....

Mehrecana Buharê di çapa Xwe Ya Duyem De

Hevpeyman xortên Sewa, û rêxistina Arîdo ya civaka sivil mehrecana Buharê ya didiwan li bajare Qamişlo, li navenda rêxistina Asûr hat lidar xistin, mehrecanê pênc rojan çalakîyên xwe jî stiran, şano, filmên belgeyî, pêşengehên şewekarî û fotografi, berdewam kirin, bi tevlibûna beşdaran jî hemî pêkhatan roja çarşemê 30ê Nisanê 2014 mehrecan bi gurzek çalakî bi dawî bû.



Ji Calakiyên Komela Rewşen Bedirxan



Di 17.04.2014 an de, li navenda komela Rewşen Bedirxan, li bajare Efrînê, Komelê kongira xwe ya sêyemîn, di bin silogana (Şêr şêr e, çi jin çi mêr e) li dar xist. Pirograma kongir bi kêlîkeke bédeng li ser canên pakrewanên doza Kurdî û şoreşa Sûriyê dest pêkir. Paşê, rapora ku komîta rêvebir amade kiribû hat xwendin. Piştî xwedina raporê kar û çalakîyên komelê yê di salekê de hatin nirxandin, û piştî tebînên sêdar jî aliyê endamên Komelê ve tozîkeke nû hate danîn. Di vê kongrê de, careke din hat teqezkirin, divê ku jina kurd ligel mêrê kurd di hemû warên jiyane de, bixebite, û ew bêrol nemîne, ji ber ku civaka ku jina wê ne di doza kar û xebatê de be, ew civak pêş ve naçe, û berî ku ew derbasî wê xebatê bibe, divê ew azad be. Xala dawiyê jî pirograma kongir mamoste Kifyet Hesen wek seroka komelê, Lewend Hebeş wek cîgir û komîteke kargêriyê jî hatin hilbijartin.

Mêvanên "Palo" Li Ser Tiliyan Di-hatin Jimartin



Di 9.5.2014 an de, 23 saliya koçbarkirina seydayê helbestevan nemir Ehmedê Palo, girûpek nivîskar û rewşenbîr li goristana Mehmeqeye li bajare Qamişlo serdana goma mele Palo kirin. Hêjayî gotinê ye ku berhemên mele Ehmedê Palo bi dehan e, lê tenê du berhem jî wan hatine çapkirin ya yekê helbest e (Dewr û gera Kurdistanê) û pirtûka duyem (Rêzimana Kurmancî). Seydayê Palo naskirî ye ku wî dirêjtirîn helbest di dîroka toreyê gerdûnî de risîye, ew jî hîna destnivîs e, bi navê (Civîna Nemiran), tê de seyda dide pêşiya dastana (Ilyaza) ya Homîros û peyama (Xufrana) ya Me'erî. Mixabin mêvanên Palo li ser tiliyan dihatin jimartin, ew jî ji ber nakokiyên nivîskaran û saziyên wan. Dilovani û aramî jî canê Paloyê nemir re, man û geşbûn jî bîranîna wî re.



مطبة محروقات
ميديا
GAZIYA MÎDIYA
 Salih Giştî
 صالح كشتي
 قامشلي . الشارع العام . مقابل الجمارك 450076

YEKEMÎN FÎLMA SÎNEMAYÊ LI ROJAVA HATE KIŞANDIN

THE ROAD TO ALEPPO

فيلم الطريق إلى حلب



Derhênerê Kurd Şiyar Abdî filmeke nû bi navê "Li ser rîya Heleb", li rojavayê Kurdistanê li bajarê Kobanî kişand. Hemû lîstikvanên ku di filmê de cih girtine, ji xelkê herêma Kobanî ne, û cara yekemîn derdikevin pêşberî kamerayê. Film behsa serpêhatiya ciwanekî bi navê Ronî dike, ku

ji Ewropa bi rêdikeve û li diya xwe ya li Sûriyê girti digere. Film wê beşdarî yek ji mezintirîn festivalên sinemayê li Ewropa Locarno bibe. Derhênerê filmê Şiyar Abdî, niha li Hewlêrê ye û amadekariya senaryoyeke nû dike. Abdî berê jî derhêneriya filma (Meş) kiribû, ku gelek xelatên navdewletî standibûn.




Yekîtî Ne Girêdana Reng û Paçan e Yekîtî Ya Dil û Milan e. DE BIBIN YEK

Wizya büyer

(Hêviyên Silbûyî) Yên Dr.Şiyar Silêman Derket

(Hêviyên Silbûyî) navnişana berhema Dr.Şiyar Silêmanê, di derdora 100 rûpelî de, Şiyar ezmana xwe di wêjeyê de bi çar çîrok û hivedeh helbestan pêşkêşî xwêneran dike, pirtûk bi çapeke xweşik û naverokeke hestnazîk derketiye. Şiyar di helbestekê de dibêje:

Gula xemgîn
 li nik min pir biha ye
 te dil birye
 me can jî tev daye
 ji min dûr î
 ji min şahî cuda ye
 dilê min.



XAÇERÊZ

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1										
2										
3										
4										
5										
6										
7										
8										
9										
10										

ASOYÎ:

- 1- Rojnameya kurdî ya yekem.
- 2- Erê bi zimanekî din, leşkerên pir.
- 3- Xwarîna nîvro.
- 4- Serekê gund, zarokê jê re bû, genimê hêrtî.
- 5- Endamekî laş(vajî), paşdaçek(vajî).
- 6- Dijî wer, germa.
- 7- Ji bo neyîniyê, rojeke heftiyê, birayê bav.
- 8- Alava xwedîtîne, nalîn(vajî).
- 9- Helbestevanekî navdar.
- 10- Paşdaçek, jêr.

STÛNÎ:

- 1- Bajarekî rojavayê Kurdistanê, ji çandiniyan e.
- 2- Eger(vajî), li ser qadê ye(vajî), perên yekî li yê din in(vajî).
- 3- pirtûka wateyeyan.
- 4- Li daristanê hene, wek hev.
- 5- Miletê e, wek hev.
- 6- Xwarineke genimî, mal(vajî).
- 7- Reş, bê av, cînaveke kesî.
- 8- Welatekî asya+jî bo dirûtîne(vajî), piş.
- 9- Ji bo gelekjimara navan (vajî), mirov(vajî).
- 10- Kêf, sewal.

Naşiyonal Cografik: Hewlêr Yek Ji Baştirîn Bajarên Toristiyên Cihanê ye

Govareke navdar a cihanî dibêje, ku bajarê Hewlêrê weke yek ji baştirîn bajarên toristiyên cihanê di sala 2014an de hatiye destnîşankirin. Govara (National Geographic) di hijmara xwe ya dawiyê de babetek li dor bajarê Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê belav kiriye û têde ragihandiye, ku Hewlêr di nava baştirîn

bajarên toristiyên cihanê de cihê xwe girtiye. Govara navhatî di babeta xwe de behsa rewşa avedanî û ewlekarî ya Hewlêrê kiriye û nivisandiye, Hewlêr di bi warê siyasî, ewlekarî û avedanîyê de xwedan rewşeke gelek baş û aram e. Di beşeke din a raporta han de bajarê Hewlêr weke yek ji baştirîn bajarên toristiyên cihanê di sala 2014an de hatiye destnîşankirin



Google Bi Balafirên Bê Balafirvan Dê Enternetê Belav Bike

Kompaniya Google a Emêrika ku ji aliyekî ve bi Facebookê re di rikberiyê de ye, ragihand ku wê hejmarek ji balafirên bê balafirvan kiriye, û dê balafirvan ji bo ku enternetê li deverên cuda yê cihanê belav bike bi kar bîne, bi teybet li deverên hejar ji cihanê. Google ragihand ku wê 20 karmand erkdar kirine ku bi vî karî rabin, lê wê ji aliyê xwe ne bihabûna vî pirojê û ne giranbûna bihaya balafirên ku kirîne eşkere

kirin, google tekez kir ku wê hejmarek ji balafirvan bê balafirvan ên bi tihna rojê kar dikin ji kompaniya Taytan kirîne. Balafirên Taytan ên bi tihna rojê kar dikin dikarin demên dirêj li ezman bimînin ku dighêje 5 salan û sinyalên enternetê li deverên cihanê yê hejar belav bikin û bi vî yekê wê gelek welatîyên hejar li dinyayê karibin sûtê ji xizmetên ku google pêşkêş dike bigirin bi teybet di demên bobelat û felekatan de.



ŞAR Pîroz Be..

Ji kovara Şar re, hejmara wê ya (1)ê, pîroz be, hêviya me ew e ku bi serkeftin û pêşveçûnê, cihêkî xuya di nav xwişkên xwe de bigire, da ku em bi hev re karibin qada çand û ragihandinê di Rojavayê Kurdistanê de geş bikin. "Büyepress"



Xelatkirina Jinek Kurd Li Emrika



Revenda Îranî li wîlayeta California xelat dan jimareke jinên ku keda wan di têkoşînê de hene, ku yek ji wan jinan xanimek ya Kurd bû bi navê Munir. Xanim Nahid dayîka 2 şehîdan e, ku herdu kurên wê di destpêka şoreşa îslamî ya Îranê de, li ser destên rejîma melleyan hatin bidarvekirin. Derbarê vî yekê, xanim Soraya Felah, çalakvana mafên jinan li ser xelatwer-girtinê bi Dengê Emrika re axivî û rola xanima Kurd Munir Nahid anî ziman.

Wê Laleya Mûşê Ji Hêla Aboriyê Ve Sûdê Bide



Rêveberiya dezgehên pêşvebirina çandiniyê ya Bercayê dest bi xebatan kir ku ji gulên Lale yê li bajarê Mûşê yê Bakûrê Kurdistanê hêşîn dibin, ji hêla aboriyê ve feydê bibînin. Li deşta Mûşê gulên Lale bi siruştî, piştî ku hewa germ dibe derdikevin. Endazyarê genetîkê yê rêveberiya dezgehên pêşvebirina çandiniyê ya Bercayê Umîd Ore daxuyanî da û destnîşan kir ku dê Lale jî wek silqan (pazîk) ji hêla aboriyê ve feydeyeke mezin bide û dê Mûş di vî warî de bibe navend. Ore diyar kir ku li dinyayê herî zêde ji sedî 80 Lale Li Hollandayê tîn çandin û li Tirkiyê jî tenê li Qonyayê tîn

çandin. Ore got ku armanca wan ew e ku li deşta Mûşê Laleyên ku mezin dibin ji hêla aboriyê ve bikin tiştêkî bifeyde. Ore destnîşan kir ku ji parastina Laleyên ku li Deşta Mûşê mezin dibin û ji bo ku cureyên Laleyên adapte bikin projeyek dane destpêkirin û wiha got: "Di destpêkê de emê cureya laleya ku li deşta Mûşê hêşîn dibe biparêzin û zêde bikin. Ji bilî vî me ji Qonyayê 9 cure lale anîn û em hewl didin ku wana fêrî şert û mercên deşta Mûşê bikin. Ji bo ajotina laleyan me parselên ceribandîne amade kirin. Di vî warî de em gellekî pêş ketin. Heke proje temam bû emê parve bikin."